Ev demên çînê wê dema ku wê kesên Sima Qian wê weke *'dema sed dibitanî'* û wê werênê ser ziman. Di wê çerçoveyê de wê temenê wê gotinê wê bi gelek derketinên hizirkî û felsefeyî ku wê bibin. Wê di demên ku wê derkevin de jî wê ji aliyekê ve wê, bi rengên *'nerîn'* wê di regekê de wê xwe bide dîyarkirin. Mînaq piştî konfiçyus wê weke Mencius wê, bi hizir û darazên xwe yên li dijî çîna serdest ên hişk re wê bê dîtin. Weki din wê ekolên weke *'Mo di'* ku wê derkevin wê li ser temenê konfiçyusîyê wê li dijî rewîsta wê ya bi imparatori û ji aliyê çîna serdest ve wê derkeve û wê, di temenekê hedonist û gelparêzî de wê, hizrên xwe wê werênina ser ziman. Gotinên weke *'em fermanê bidin mirovan ku ew hês hev bikin ev ji çûna şer û hevdû kuştinê ne zortir bê'* re wê hizrên xwerina ser ziman. Hizrên *'mo dî'yan* wê di regekê de wê çerçoveyek mantiqî wê bidina dîyarkirin û wê, di bin navê *'kanonikên mo dî'yan* re wê werina bisazûmankirin. Lê ev ekol bi xwe jî wê li ser filosofên çînî ên weke *'yang zhu'* re wê beşbûnên wan derkevin. Mînaq wê, di nava têgîna hizrên *'mo dî'yan* de wê, *'cewherparêzî'* ku wê derkeve li pêş û di regekê menewî de wê, di temenekê sermedî ê rûhanî de ku wê bihizirin wê, li filosofên weke Yang Zhu wê li dijî wan derkeve û wê di temenekê hebûna kirinîya jîyane di dînyayê de wê di temenekê hedonist de wê derxê li pêş û wê, di wê çerçoveyê de wê reng û şîroveyekê bi wê re wê bikê ku ew wê pêşbixê.

Ya ku wê di aslê xwe de wê, di nava hizir û felsefeya konfiçyusî de wê bê temenê lêpîrsînan wê hinekî jî wê dema Ch bê. Wê di wê demê de wê ew sazûmanek rejimî a pîrr zêde bi tûndûtûjî ku wê temenê wê li ser

zagonên tafisandinê wê avabê û wê herkesekê wê zorê bidiyê ku ew îteatê li otoriteya navendî bikê re wê, derkeve li pêş. Ev wê li gorî hinek kesên ku wê demê şîrove dikin wê, bênina ser ziman ku wê ev wê taqabûlî dema dawî lê hatina şerên welatan bi otoriteya navendî wê were. Û li ser wê re wê ew wê ji aliyekê ve wê bixwezin ku ew wê bi ceberûtiya Ch´ ve wê bidina girêdan.

Hizrên Konfiçyusî wê di wê demê de wê bi Yang Zhu re wê şîroveyek wê ya ku ew di temenekê de wê temenê taoismê û konfiçyusê wê bi hevdu re wê çawa nêz bikê wê di wê temenê de wê bikê.

Lê li çînê wê di dema xanadana han de wê, du dema Wu de wê, wê kevneşopîya afsûnkarên weke 'hunang-lao' wê bi zêdeyî wê derkeve li pêş. Di dema xanadana han de wê li herêmên rojava wê bi zêdeyî wê derkevina li pêş. Wê konfiçyusî wê zêde ji wê nexweş bin û heta ku wê li dijî wan wê serî li mijarên tûndûtûj jî wê bidin. Lê ev kevneşopî wê dem bi ser ve herê hata ku wê ew bê û pêşkeve û rûnihê. Wê di dema imparatorê zer û Lao -Tzu de wê, li dora sedsale 1´min a berî zayinê de wê, rengê xwe di awayekê de wê bide dîyarkirin.

Di aslê xwe de wê di wê demê de wê bi zêdeyî wê bûdism jî wê hin bi hin wê were çînê û wê di wê demê de wê, ne tenê wê weke kevneşopîyekê wê bandûre li otoriteya konfiçyusî wê bikê wê ji wê zêdetirî wê rewşa taoismê ku ew hê ne bi wê rengê di awayekê bi sazûmanîya li gorî renekê felsefeyî a demê ya wê, ew jî wê bi wê re wê di renekê de wê pêşkeve û wê derkeve li pêş. Taoist wê di awayekê de wê, ji bûdistan wê sudek baş bigirin ku ew xwe di awayekê de wê pêşbixin û serwer bikin. Rewşên weke bi çêkirina peykelan û hwd ku wê derkeve li pêş wê di pêjnên wan de wê, sûdigrtinek wê bibê. Mînaq wê, di hinek peykelen bûda ku wê li herêma **Sichuan** wê werina dîtin wê, bi pêjnên taoist ku ew hatina xamilandin wê werina dîtin.

Di aslê xwe de wê, kevneşopîya huang-lao wê, bi zêdeyî wê weke kevneşopîyek kevn wê derkeve li pêş. Wê di wê de wê ji rewşên metafîzîkî, afsûnî û kosmolojikî bigira wê gelek awayên ku mirov dikarê bi wan re kifşbikê wê hebê. Wê, di çerçoveyekê de wê xwediyê sazûmanek hizirkirinê ku wê bawerîya wan bi gîyanên sermed û hwd wê di temenekê yazdanî de wê bibê wê xwe bide dîyarkirin. Di hinek rengên hizirkirinê ên wan de wê bi taoismê re wê levkîrin wê bibê wê di wê temenê de wê ji hev re wê bina pişt. Di aslê xwe de wê, di pêşketina dema imparatorê û lao-tzu de wê, ew wê bi hev re wê temenekê desthilata demê wê di wê temenê de wê bi hev re wê biafirênin. Bûdism

wê li ser wê temenê wê, weke temenekê fahmkiirinê wê pêşî tevli wê yelpzeyê wê bibê û wê piştire wê bi sazûmana wê pêşketinên ku ew wê di wê temenê de bi pergali, civaki û hwd wê bide çêkirin re wê li ser aqil û felsefeyê û rengên fahmkirina olî û hwd re wê bide dîyarkirin.

Lê ku mirov ji kijan aliyê ve wê binerê wê taoism wê weke kevneşopîyekê wê bi temen bibê û wê pêşkeve. Yê ku wê aliyê wê yê felsefeyî wê piştî bi olbûna wê re wê jinûve wê bi şîroveyên xwe re wê bikê wê, Lao-Tzu bê. Di aslê xwe de wê, Di nava pêvajoya taoismê û bi teybetî taoisme felsefe de wê bi zêdeyî wê navê wî bi giringî wê derkeve li pêş. Navê wî bixwe jî 'lao' wê were wateya hostayê pîr' û 'tzu' wê ji zaninên mazin û berhemên kevn re ku wê weke têngînek methiya wê di rengekê de wê were dîtin. Di derbarê jîyane lao-tzu de wê, şîroveyên ku wê werina kirin ku wê ji aliyekê ve wê çavkaniya wan Sima Qian bê wê li ser wê re wê, hewlbêdayin ku ew di awayekê de di çerçoveya têngînên wî de bi awayekê were pênasekirin û ji wê bê ghiştin li awayekê fahmkirinê. Lao-tzu wê di dema xanadana Chu de wê, derkeve li pêş û wê di qasrê de wê weke 'dîrokzan' û ankû 'astrolojekê' wê bijî. Di wê demê de wê, ew wê li ser temenekê xweza û rêgeza taoismê a 'bêtevgeriyê' wê bisekinê û wê xwandinan wê pêşbixê.

Taoism wê di rengekê de wê, di wê demê de wê bi bûdismê re wê pêşketinekê wê bijî. Hata ku wê weke ku wê Sima Qian wê bîne ser ziman wê, piştî ku wê navenda xanadana Chu wê zayif bibê wê, ji navenda wê 'lo-yang' wê herê bi ber aliyê hindistanê ve. Wê di wê demê de jî wê di nava bûdistan de wê bijî. Wê heta ku wê dema ku ew dihê hindistanê wê di pêşxistina budismê a li wir de jî wê weyneke wê bileyizê wê were hanîn li ser ziman.

Lê di derbarê Lao-tzu de wê, vegotinên ku ew dihên ser ziman wê di serî de wê hinekî di temenekê nepenîparêzî de bin. Wê bi awayekê efsaneyê wê werina ser ziman. Minaq gotinên weke 'lao-tzu li azmana bilind bû' ankû 'bi têngînek reakarnasyonî 'jinûvebûna lao-tzu' ku wê werina hanîn li ser ziman wê di wê çerçoveyekê de wê karibê werênê ser ziman. Lê ku mirov çawa wê fahmbikê jî wê, mirov dikarê bêjê ku wê kesekê bi wê rengê ku ew dijî wê hebê û wê bandûra wî li ser hizrên taoismê re wê, li herêmê wê bi zêdeyî wê pêşkevin û wê belev bibin. Di dewama wê de wê ne tenê ji aliyê felsefeyî ve lê wê ji aliyê weke olekê tefskirkirina taoismê jî wê bandûra wî di wê de wê hebê.

Aliyekê din jî wê di wê demê de ku wê bi zêdeyî wê taoism wê bi zêdeyî wê di bin zorê de bê û wê ne azad bê wê, were dîtin. Di dema

Sima Qian de wê, bê gotin ku wê Lao-tzu wê rastî hev werin li 'Shiji'. Lê ev çendî rasta û ankû ne rast a wê, di derbarê wê de wê gûman wê hebin.

Hizrên taoismê wê di wê demê de wê di aslê xwe de wê bi awayekê wê bandûra xwe wê hin bi hin wê di temenê têngînek olî a bi felsefeyî de wê bidina dîyarkirin. Lê di çerçoveya têngîna taoismê de wê, ev mijare rasthev hatina lao-tzu û konfiçyus wê, ji aliyê hinek dîrokzanen ve wê bê naqşkirin. Mînaq wê di yekê ji wan de wê bi wê rengê wê were gotin ku wê di rasthatina hev de wê lao-tzu wê ji konfiçyus wê bipirsê ku wî tao dît û ankû na. Dihê gitin ku wî bersiv da û got "min ew 10 salan lêgerîyam lê min ne dît." Li gorî ku wê were gotin Lao-tzu wê ji wî re wê van gotinan wê vebêjê. "mîrovê bizane hêj rewşîyê dikê. Xwe li tiştên ne dîyar nadê ragirtin, demê û şartên wê lêdikolê. Ku cih û dem di cih de bê wê biaxifê, ne di cih de wê bêdeng bimênê. Yekî xazineke wî hebê wê şanî her kesê nadê. Demek ku, kesê bizane hikmetê xwe ji herkesê re na vebêjê."

Lao tzu wê weke kesekê ku ew di dîmenekê ku ew di demê de digerihe û ankû li deverên cihê ên demê xwe dide dîyarkirin wê di rengekê de wê, ji jê were bahskirin. Di nava gelek deman de wê di rengekê de wê ji jê were bahskirin. Lê Lao tzu wê di awayekê de wê, weke kesekê giring ê ku ew wê bi 'tao te ching' ku de dinivîsênê de wê temenê rêgezên taoismê wê di rengekê de wê bi awayekê gerdûnî wê temen û rengê wê bîne ser ziman.

Di aslê xwe de wê, mîrov dikarê wê werênê ser ziman ku wê î ro wê dema ku em li nava nivîsên li ser taoismê dinerin wê di rengekê de wê, di wan de wê taoism wê bi demên pirr zêde kevn ên dîrokê re wê, di dîmenekê de wê werê hanîn li ser ziman. Di nava hizrên wê de wê, lêgerinên hizrên şamanismê wê di awayekê de wê, dîrok û mejuya wê bi wan re wê heta demên li dora destpêka pêvajoyên şariştaniyê jî wê bê birin.

Lao-Tzu wê çendî wê weke kesek giring û navend wê di nava têngîna felsefe û olîya taoismê de wê bê dîtin û xwe bide dîyarkirin lê wê li ser wê rengê ku wê taoism dihê tefkirkirin û şîrovekirin mîrov nikarê bi wê re wê werênê ser ziman ku wê, taoism bi wî re wê dest pê bikê.

Lê em wê dikarin wê bêjin ku ew dema ku wê bê gotin ku wê lao-tzu wê di wê de wê bijî wê demek kevnê a felsefeyê bê û di wê demê û temenê de wê li ser çerçoveyek hizirkirinê a bi rêgezî ku wê bi wê re wê were lê hizirkirin wê bibê. Di wê temenê de wê li ser wê temenê bi bawerkirinê, û ankû gihiştina şewayekê felsefeyî ê hizirkirinê wê di wê

rengê de wê, di dîmenekê de wê bi xwe re wê di awayekê de wê bide dîyarkirin.

Di çerçoveya têngîna taoismê de wê mirov dikarê wê bînê ser ziman ku wê dem bi dem wê têngînên felsefeyê ên weke konfiçyus û hwd wê bidina dîyarkirin û serwer bibin û ku wê çendî taoism wê weke dem bi dem wê di dîmenekê weke di bin tafisandinê de were dîtin û wê pêşîya wê were girtin ku ew pêşkeve û xwe werênê ser ziman jî lê wê di xatekê û awayekê de wê weke ku ew têngînek temenî a bînavber ku ew xwe dide domandin û dem bi dem wê di wê temenê de wê xwe biafirênê û bide hanîn li ser ziman. Di wê warê de wê, di demên kevnera û heta demên piştî demên kevnera û serdema navîn jî wê di demên wê de wê, rastî awayên hizirkirinê ên ku wê bi wê re wê were lê hizirkirin û pêşxistin jî.

Di temenekê felsefeyî de wê, çerçoveyek hizirkirinê û kirinê wê di temenekê xwezayî de wê bi dîmenekê wê bi xwe re wê bide dîyarkirin. Lê em wê dikarin wê bêjin ku wê di demên kevnera de jî wê bi navê taoismê wê dibistanên wê weke 'tao chia' û hwd re wê bibin. Weki din wê di biniterên niviskî de wê nbi rêgezî û felsefeyî ku wê temenê wê biafirênê wê çerçoveyek fahmkirinê wê bi wê re wê were dîtin.

Têngînên weke bi têngîna gihiştina nemiriyê ku wê bi wê re wê were bikarhanîn wê bo wê jî wê teknikên weke yên meditasyonê û hwd wê bikaerbênê. Weki din wê şêwayên weke sîmyageriyê, afsûnê, kirinên fîzîkî ên weke bi tenknîkî li ser esasê bêhn danûstandinê û hwd re wê bîn bikarhanîn. Minaq wê di teknikên weke ku wê li dora sedsale 2' min piştî zayinê ku wê ji aliyê filosofên wê xatê ên weke bi navê 'chang tao ling' ve wê, di temenekê bi kirinên fîzîkî wê li wan wê bihizirê û wê di wê temenê de wê, heta ku wê rewşên weke bi fîzîkî ên bi seksê wê weke di şêwayê werjiskirineka bi ritueli wê di temenê temen dirêjkirinê û ankû weke ku wê bi wê were bawerkirin gihandina nemiriyê û hwd re wê bê dîtin wê werina pêşxistin.

Li ser wê temenê ku em bîna ser ziman wê bi demê re wê, li ser temenekê dibistanî wê gelek têngînên ku em dikarin weke 'fraksiyonên taoyî' bi navbikin ên weke bi navê 'tao chiao' û hwd wê di wê temenê de wê, pêşkevin. Ev jî wê weke herikinna ku wê ekolên xwe wê li ser wê xatê wê pêşbixin û wê di temenekê de wê rengên hizirkirinê wê bi felsefeyî û ankû di temenekê bawerî û hwd de jî ku wê bê gihandin li awayekê fahmkirinê wê pêşbixin.

Di awayekê de wê dema ku em li ser têngînên bawerî û ankû olî ên weke di roja me de hena ên weke yên olî û hwd re wê salixbikê wê hinekî zor

bê. Ber ku wê taoism wê di nivîsandinên di derbarê wê de wê, demên wê yên şamani, mîtolojikî, kosmolojikî, felsefe û heta di temenê olên dema aqil û hwd de wê bi wê re wê şîrove wê di rengekê de wê werina pêxistin.

Di wê temenê de wê, di awayekê de wê, dikarê wê werênê ser ziman ku wê taoism wê di serî de wê, du dîmenên wê werina dîtin. Yek wê ew bê ku wê di nava gel de wê hertimî wê di temenekê de wê were dîtin û wê çerçoveyek yaqinkirin û hizirkirin û baweriyê û hwd wê bi xwe re wê di rengekê de wê biafirênê. Weke baweriyek nava gel a pirr zêde kevn jî wê di wê temenê de wê were dîtin. Aliyê din jî wê, di nava rêveberiyên de wê weke têngînek ku wê bi armanca bilindbûna li temenekê rûhanî ku wê ew wê bo wê were bikarhanîn bê.

Taoism li ser temenê levkiriina beden û zêhnê re wê, li ahengekê jîyanî wê biherihê û wê di wê temenê de wê bixwezê ku mirov di rewşekê de fahmbikê û bigihijê fahmkirina mirov. Di awayekê de wê, di nava xwezayê de wê li wê bihizirê û wê di wê temenê de wê lê binerê. Têgîna tao weke rêgezê xwezayî ku ew li wê dihizirê wê di wê temenê de wê weke aliyekê ku wê temenê wê biafirênê wê li wê were lê hizirkirin. Wê dema ku wê bahsa filosofên li ser şopa taoismê ku ew hatina wê were kirin wê hinek ji wan navê wan di wê temenê de wê were ser ziman. Minaq Lieh Tzu (b,z 500) , Wen Tzu (b,z 500), Kang-sang Tzu (b.z 570-543), sou-yuen (b,z 400), Kweiku Tzu (b,z 380), Ho-kwan Tzu (b.z 325-298), Chuang Tzu (b.z 330), Shi Tzu (b.z 280), An-fei Tzu (b,z 250) û hwd, wê çend ji wan filosofên ku wê di wê şopê de wê navê wan derkeve li pêş bê. Li gorî ku wê bi dîrok û mejuya taoismê ku wê were ser ziman wê bandûra wê li ser temenekê felsefeyî wê li têngînen felsefî û bawerî ên ku wê li wê herêmê wê bîn û bijîn wê hebê. Heta ku wê li gorî ku wê were gotin mirov dikarê di wê temenê de bahsa zen-bûdismê û konfiçyusmê jî bikê.

Di derbarê dîroka felsefe, ol û civakî a taoismê de wê hizrên ji hev cihê wê werina ser ziman. Lê di hemû yan de jî wê hinek nuqtayên hevbeş wû hebin. Ew jî wê ew bê ku wê li ser temenekê civakî û di nava xalkê de wê bi bandûr bê, wê di temenekê xwezayî de wê xwediyê rêgeza tao û felsefeya wê ya jîyanî bê, wê li dijî şer û tûndûtûjîyê û hwd bê. Wê di wê temenê de wê bi wê re wê di reng û awayekê de wê bi wê re wê were ser ziman. Lê piştî ku wê budism wê were û pêşkeve wê, biqasî ku mirov wê ji têkiliya nava wan wê fahmbikê wê bandûra budismê wê li wê û pêşketina wê ya bi sazûmanî wê bibê. Wê di temenekê têkiliyî de wê,

pêvajoyek hev fahmkirinê wê di nava wan de wê derbas bibê û ev jî wê bê temenekê nêzbûna li hev û bi wê re sûdgirtina ji hev jî.

Budism wê di rengekê de wê, weke têngînek dema kevnera û heta ku em dikarin wê destpêkek giring a di wê temenê de li herêmên asya dur ên di wê temenê de jî bê. Wê, bi awayekê wê bi têngîn û rêyên wê yên weke 'zenê' û hwd re wê, temenekê şîrovevî û awayê wê pêşî bi nixên heyî re ku wê pêşbixê wê di aslê xwe de wê, di çerçoveya gotinên felsefî de wê bigihênê li rengekê fahmkirinê. Ev pêvajo wê, di nava hizrên taoismê de jî wê, hin bi hin wê li ser temenek kosmolojikî wê bi hizrên filosofên taoist ên weke Lieh –Tzu û ekola wî re wê, li ser temen û çerçoveyek kosmolojikî û hwd re wê di wê rengê de wê çerçoveyek hizirkirinê wê biafirênê. Lieh –Tzu wê, di awayekê de wê hinek hizrên ku ew dihênê ser ziman wê, di temenekê rexnegirî li hizrên konfiçyusiyan de jî bin. Wê di wê temenê de wê weke ku wê Chang Tzu ku ew red dikê tevli rituelên konfiçyusî. Li gorî Chang Tzu wê rituelên konfiçyusî wê mirovan bidina herikandin li rêyek derewîn. Ber vê yekê ew tevli nabê.

Lieh –Tzu wê bi zêdeyî wê giringîyê bide parastina giyanî û di wê temenê de wê, bêtê ser ziman ku wê gerdûn wê xwediyê temenekê sermedî bê û wê bi rêgeza taoyî wê pêşkeve. Li gorî wî dema ku mirov gîyane xwe xort bikê wê karibê pirr zêde zêdetirî ji ya ku ew dijî ew bijî. Lê ew di wê temenê de dihênê ser ziman ku mirov li şûna wê xwe diberdê û xwe dikê bin fermanê û di wê temenê de li gorî farmanê jînkirinê wê bijî.

Di awayekê de wê, têngîna taoismê a xwe berdanê wê dikarê wê hinekî li wê bihizirê. Wê çendî ku wê weke têngînek baxtewarî wê di dîmenekê xort de jî wê were dîtîn jî lê mirov nikarê wê bi temenî di rengekê wusa de wê fahmbikê û wê bixwênê. Ber ku wê, wê, bi zêdeyî wê, di temenekê xwezayî de wê bi wê re wê bihizirê. Têngîna xwezayîyê bi kirdeya 'serbestbûnê' û 'jixwêrebûnê' ku ew di wê de bi wê dihizirê wê, di rengekê de wê, di awayekê levkîrinekî a bi xwezayî ku mirov wê bijî de wê fahmbikê. Li ser wê temenê wê, ji xwêrebûnê û di rewşa xwe re pêdeçûyîniê û ankû ji xwe re hiştinê wê di wê temenê de wê derxê li pêş.

Ya ku wê di wê temenê de wê li ser têngîna Lieh –Tzu re wê, hizrên xwe wê di temenekê 'legelist' de wê, formulebikê Fa-chia ekola wê bê. Ankû wê fei tzu bê. Wê di dema weke ya xanadana han û hwd de wê bi zêdeyî wê ew wê bi hizrên wan re wê bê temenê ku ew bi zêdeyî weke hizrek fermî hin bi hin pêşkeve û derkeve li pêş û li giştiya welêt pêşkeve û belav bibê.



Di aslê xwe de wê têngîna taoismê wê dema ku mirov wê werênê ser ziman wê, weke xatek ku wê li wê were hizirkirin wê berî demên kevnera jî wê weke ku wê were lê hizirkirin û şîrovekirin wê hebê. Lê di wê demê de wê bi zêdeyî bi bandûra pêşketina qilê felsefeyê re wê bi zêdeyî wê derkeve li pêş. Heta ku wê ji hizrên konfiçyusiyan re wê, gelek hizrên weke artarnatif jî wê pêşbixin.

Her çendî ku wê di wê temenê de wê hertimî di dîmenekê weke di temenê serwerîya wî de wê weke 'aliyê duyem' wê bimênê jî lê ji temen ve wê di nava gel de wê weke alî û têngînek ku wê bandûra ne kêmbê. Ber vê yekê wê, di nava kevneşopî, orfûadetên civakî ên herêmê de wê, di awayekê de wê şîreyetî wê bikê û wê bi wê re wê, pêvajoyên xwe yê pêşketinê wê ji temen ve wê bide dîyarkirin û domandin. Dem bi dem rêveber û ankû impaaratorên ku wê, derkevin û wê heya wan her ser taoismê wê, hinekî wê aliyekê wê heya wan wê bi armanca serwerîya wan ve girêdayî wê hebê. Aliyê din jî wê di temenê azweriya mirovî a nemiriyê û mayindabûnê û hwd re wê bi wan re wê di wê temenê de wê xwe bide dîyarkirin bê.

Di aslê xwe de wê felsefeya taoismê wê aliyekê wê yê giring wê hebê ku mirov wê li vir wê bikirpênê bê. Ew jî wê li ser temenekê xwezayî ku ew di çerçoveya şopandinê û modelên wê yê ku ew kifşdikin wan fahmbikin û bi wan re xwe gihandina astek fahmkirinê re wê were dîtin. Di taoismê de wê mijare tao a serek wê mirov bê. Wê weke gotina wê ya din a giring wê 'te' wê, di wateya di mirov de ku ew tao were jin kirin û mirov di xwe de bihêlê ku ew li gorî tao bijî re wê were bi temenkirin di fahmkiriinê de. Wê 'te' wê di wateya 'taoya di mirov heyî' bê. Wê bi wê wteyê re wê, were fahmkirin.

Li vir wê gotina 'bêtevgeriyê' ku wê bi taoismê re wê werê ser ziman wê di wê temenê de wê, ne bi wê wateyê bê ku mirov ti tiştî nekê bê. Wê di awayekê de wê li ser temenê ku mirov rast bikê û li gorî ya rast bikê. Ev wê mantiqê xwe de wê di têngîna 'te' de wê bide dîyarkirin ku mirov li gorî tao bijî û di xwe de derfetê bidiyê ku tao xwe bide jîyankirin bê. Di wê temenê de wê di taoismê de wê ya asil mirov a û wê her tişt wê li ser dilxweşî û başîya mirov wê were kirin. Li gorî tao wê, heta ku hikimdar jî bo dilxweşî û başîya mirov bixabitin. Bi giştî dilxweşî wê weke dilxweşîya giştî a civakî bê û ew wê temenê civakek xwezayî û bi aram wê biafirênê li girî wê.

Di dewama wê de ku mirov gihişt dixweşiyê wê civak jî wê bigihijê. Ku civak gihişt wê ew jî bo ya mirovatiyê bixabitê. Di wê temen de wê,

hemû çerçoveya wê di dewama hevde wê hev temem bikê û wê di wê temenê de mirov dikarê wê fahmbikê û wê werênê ser ziman.

Çendî ku wê di felsefeya taoismê de wê di temenekê hîyararşiyî û giştî de wê di wê temenê de wê bahsa hebûn û gerdûnê wê bikê jî lê em di nava têngîna wê de wê zêde rastî wê nayên ku ew navê xwûdayekê hilde ku ew bi wê werênê ser ziman ku gerdûn afirandîya. Wê dema ku mirov bahsa têngîna taoismê a gerdûnî bikê wê bi bawerîya her tişt di nava hev de dihalihê tevlihev dibê. Di dewama wê de wê, sînorê wê nebê wê werê dîtî û bê hanîn li ser ziman. di nava hizrên taoismê û nivîsên wê de wê gelek tefsîrên li ser hebûna gerdûnê, xwezayem dûnyayê û pêvajoyên wan ên bûyînê ku wê bîn sekin in wê **hebin**. Lao-tzu bûyîna gerdûnê bi têngîna tao re hanîya ser ziman. Li ser wê temenê k uwê lao-Tzu wê werênê ser ziman wê bi gotinên weke tao yek, yek du afirand, du sê afirand, sê jî bêhasab hebûn afirand. Li gorî wê tao yekitiya pêşî çêkirîya û ev li du hêzên ziddê hev beşbûya. Ew jî xwediyê bandûr li cewherê hemû bibê. Laozi wê dema ku wê bahsa afirandina duyan wê bikê wê ard û azman wê bi wê re wê minaq bide û wê werênê ser ziman. Di wê temenê de wê çendî ku wê rengê wê ne dîyar wê were ser ziman jî wê ji nava gotinên lao-Tzu wê were fahmkiriin ku wê tao' wê weke destpêka bi 'aloz' jî wê were di rengekê de wê were pênasekirin û temenê hertiştê diafierê ku wê werênê ser ziman bê. Bi gotinên em dinerin lê em nabînin lê emê navê wekheviyê lêbikin' re wê di wê temenê de wê weke ku wê li wê **bihizirê**. Hinek têngînên ku em di nava têngîna budîsmê de dibînin ên weke berê bûyînê wê her tişt wê bédeng û bêawa heba ku wê li wê bihizirê wê di wê temenê de wê di nava têngînên kosmolojikî ên taoismê de jî wê di rengekê de wê were dîtî ku wê were ser ziman. Li ser wê re wê gotina 'ti tişt bê ku ew bi gûharê wê di xwe de wê biherikiya û biçûya' re wê werê hanîn ser ziman. Têngînên weke 'yên mazin dihên û diçin, yê diçin dûrdikevin û yê dûrketî jî wê vegeirihîn û werin' re wê, bi têngînek dewrûdayimî û di ahengekê hebûna wê ya dînguyî ku ew bi wê dihizirin wê **werênê ser ziman**. Di nava felsefeya tao de ya ku ew dihê tefkirkirin wê bi têngîna tao û ankû rêgeza tao re wê ne têngînek taoyî a sermed bê. Li ser bi navkirinê û bi gotinkirinê re wê, weke cih, war û dema wê dîyar bê wê li wê were lê hizirkirin. Di wê temenê de wê şewayekê felsefeyî ê bi gotinê, bêjeyê û hwd re weke ku em bi konfiçyus re dibînin wê bi wê re wê, di wê rengê de wê xwe bide dîyarkirin.

Di dimenekê de wê weke tiştên ku ew navê wê ne hatiya lêdanîn wê weke ya bi têngînek û rengekê bi têngîna aloziyê û hwd re wê were hanîn li

ser ziman bê. Weki din wê li ser têngîna afrînerêyê ku wê bi têngîna tao re wê were ser ziman wê ew bê gotin ku 'tao tişteke dihênê li holê, ew ji ji wê du diafirê ji wê duyê sê diafirê û ew jî hemû tiştê xwezayê dihênê li holê. Di 'chuang-tzu' de jî wê mijare hebûna gerdûnê wê were dîtin ku wê di wê de wê were ser ziman. Di wê de jî wê di wê rengê de wê bahsa afirandinê wê bikê. "navê imparatorê bahra başûr wê 'shu(lez)' bê. Navê imparatorê bakûr jî wê 'hu(çalak)' bê. Navê imparatorê navîn jî 'hun-tun' bê. Shu û hu dem di nava axên hun-tun de dihatin cem hev. Hun-tun ji wan re pirr comert tevgerîya. Li gorî shu û hu her mirov bo bixwê, bibînê, bibîhîzê, bixwe û bêhnbiştênê pêwîstîya wan bi heft qûlan hebû lê bihun-tun re ew nebû. Wan jî got qûlên hun-tun nîn in em ji wê re vekin. Her roj qûlek vekirin û dema ku qûla heftan vekirin hun-tun mir" re wê werê ser ziman. Hun-tun wê têngînek mitîkî a navendî wê di wê de wê were dîtin. Wê bi wê re wê, ev têngîn wê piştê wê dinava têngînên taoismê de wê, li ser wê dem bi dem wê şîrove jî wê werina pêşxistin.

Di felsefeya hun-tun'ê de wê, çawa wê, her qûl dema ku ew vebê wê gûharênê bijî wê bi wê re wê di rengekê de wê karibê were fahmkirin. Yanî wê, di wê temenekê de wê di rengekê de wê, ahengeî û dengeyî de wê, xwe di rengekê de wê bide hanîn li ser ziman. Di dewama wê de wê minaq wê, rewşak beşbûnên kosmolojikî mirov wê di rengekê de wê di dema chou de wê bibênê ku wê werê ser ziman. Di wê rengê de wê di rengekê de wê di hinek tefsirên ji wê demê wê were ser ziman. Kuo wê cihêbûna ard û azman bi wê rengê wê werênê ser ziman. "hikimdarên chuan-hsu wê fermanê bidina ch'ung û Lî' ard û azmên ji hev cihê bikin. Ber ku mirov li hemberê tao bêxem in. Ch'ung azman hilda û Lî jî ard dewisend." Wê di wê mîtê de wê ew wê weke çêkerê nava ard û azmên wê bîn dîtin û ser ziman.

Di çerçoveya mijarên kosmolojikî û di nava têngînên taoismê de cihgirtina wan wê dema ku mirov li navarên berhemên taoismê ên weke Tien wen, Lieh Tzu, Huai-nan Tzu û Tao-yuan û hwd dinerê wê dibînê ku wê di wê temenê de wê li ser wê bisekinê. Tien-wen wê li ser demên berî bilindbûna azman û ji wê cihênûna ardê ku wê rewş çî û çawa bê wê li ser wê bisekinê. Dema ku wê rohnî û reşîk ji hev cihê nebê wê alozî û ankû kaos wê hebê? Wê hewlbidin ku wê fahmbikin. Minaq wê Lieh Tzu wê bi têngîna wergûhara pêşî, destpêka pêşî, bûjena pêşî û hwd re wê li mijarê bihizirê û wê bixwezê bi awayekê wê bi temen bikê û wê werênê ser ziman. Li gorî Lieh Tzu wê berî bûyîna bêhna pêşî a jîyanê wê hebê. Bêhna jîyanê wê bûjenî pêşî wê li gorî wê werênê li holê. Bêhn

wê li gorî Lieh Tzu wê, tamî û giştîya darêjk û bûjenê bê. Ew cihê nebûna. Wî navê hun-tun bi têngînek kaosî hanîya ser ziman. li gorî Lieh Tzu wê kaos jî wê dikarê weke bi rengê 'di destpêkê de ku wê her tişt wê tevlihev (bi hev re û di hev de) û bi hev ve bê, û ji hev ne cihê bê' wê li gorî wê were **wateya kaosê**.

Wê dema ku mirov wê, bahsa têngîna kosmolojikî a taoismê bikê wê bi wê re wê di dewema wê de wê têngîna 'afirîna gerdûnê' wê di awayekê de wê di dewama wê de wê were li wê hizirkirin. Li ser wê temenê ku wê di nava taoismê de wê aîdî dema 'sê-keyaniyan' bê wê, mîta 'pan ku' wê were dîtî ku wê di wê temenê de wê bahsa wê were kirin. Li gorî wê pan di şibiha hêkekê û wê bi têngîna kaosê wê were ser ziman. li gorî wê tiştên ku wê ardê biafirênin wê yên giran û reş bin. Laşê pan ku her roj nih daran dî harî. Bi serê xwe azman digirt û bi lingên xwe ard di ahengekê de digirt. Piştî ku ew ji hev cihê bûn wê her roj wê azman deh fitan wê dîrkeve û ard wê deh fitan wê stûr bibê. Pan ku bi wê re her roj deh laş mazin bû. Ev wê 18 hezar sal wê bidomê. Di awayekê de wê di serê vegotinê de weke ku me hanî ser ziman ku wê bişibihênê li hêkê wê di dewama wê de wê bi cihêbûna ard û azman wê hêk weke jinîvî ve qatbibê û cihê bibê wê bi wê rengê wê hanî li ser ziman. Di nava wê de wê, temenê wê cihêbûnê jî wê, weke di nava wê girani û reşîyê de bûyîna çîroskek rohnî û roj bi roj pêşketina wê re wê werênê ser ziman. Di dewama wê de wê piştê wê, rewşên weke yên bêhn, ba û hwd bûyîna wan jî wê bi têngîna 'piştî ku pan ku mir wê êdî wê laşî wê bigûharê û wê bêhna wê bibê baş awr. Dengê wê firtona afirand. Çap û rastê wê roj û heyv afirand. Ling û deng wê çar lingên dînyayê afirand. Teliyên wê jî wê çiqilan wan afirand. Ji xwûna wê çem bûn. Ji qasên wê jî wê, tabaqayên ardûazman afirand. Ji goştê laşê ard, ji pova serî jî wê, stêrk û hwd afirin. Ji çermê laş û muyên wê şînî û dar afirîn. Ji dinan û hastûyan kevîr û girîz afirîn. Ji xwûhdana wê baran hat li laş. Parazitên li ser laş wê bi baranê bibin. Wê bi wan re zindî û mirov bibin...

Di wê temenê de wê di rengekê de wê bi hûrgilkirina wê re wê were hanî li ser ziman. Ev şewayê vegotinê wê di rengekê de wê, şewayekê vegotinê ê di mîtoolojiya sumeran ku wê bi kûştina abzû a jî aliyê şamaş ve ku wê çawa wê bi vegotinê wê, bê ser ziman ku wê çawa wê ji jî laşê wê ardûazman û tiştên di wê de wê bibin wê weke vegotinek hûrgilî a ku wê di wê çerçoveyê de wê were ser ziman jî wê dîmenekê wê bi xwe re wê di rengekê de wê bi wê re wê bide dîyarkirin. Li ser wê temenê wê têngîna pan-ku wê di awayekê de wê bi mantiqê xwe re wê li ser temen û

çerçoveyek hevqirtinê û beşbûnê a felsefeyî wê rûniştî wê karibê were fahmkirin. Ev şewayê mîtolojiyê wê, di wê temenê de wê piştre wê weke ku em di rengên vegotinên piştre ên weke xanadana han de ku wê lao-tzu wê bê xistin cihê 'pan-ku' de û wê bi wê rengê wê were hizirkirin û wê ji laşê wê bi wê rengê wê çawa wê afirandin bibê wê di renekê mîtkî de wê bi navê lao-tzu de wê were ser ziman. Ev jî wê weke mîta lao-tzu wê were bi navkirin û wê were ser ziman. Gotinên weke 'ji beşên laşê lao-tzu gerdûn afirî', 'çavên wî roj û heyv afirî', 'ji serê lao-tzu çiyayê mazin k'un-lun' afirî', 'ji pora wî stêrk afirîn', 'ji hastûyên wî zindî û ejder bûn', 'heywan goştê wî bûn, 'marên avê ji roviyên wî bûn' û hwd wê di wê temenê de wê bi wê ve girêdayî wê werina ser ziman.

Di kosmolojiya taoismê de wê dem wê ne destpêka wê û ne jî dawîya wê hebê. Wê di temenekê gerdûnî de wê bê hildan li dest û wê wereê hanîn li ser ziman. Di nava têngîna bûdism û hinduismê de jî wê têngek gerdûnî a ku wê bi wê were bawerkirin ku wê bi dem û pêvajoyên li dûv hev dihên û hev dişopênin wê di awayekê hetaheta de wê xwe bide domandin. Di awayekê de wê, weke ku wê were dîtîn wê bandûra wê têngîna wê di renekê de weke ku wê li taoismê jî wê bibê. Weki din têngîna demê a zerdeşt ku ew di renekê de weke ku ew di avêsta de dihênê ser ziman wê bi zerwan re jî wê bi awa û darêjk bikê û wê werênê ser ziman wê di wê temenê de wê, hemû tiûştên di nava wê de wê bi ahûra mazda û ahriman û kirinên wan ên nava wê de wê bibê wê werênina ser ziman. Weki din wê her tişt wê li ser temenekê bandûr li hevqirtinê ku ew bi temen dikê û ew di wê temenê de wê bi têngenek dualiteyî a nava wan re wê werênê ser ziman. Di têngîna demê a zerdeştî de wê, sînor û destpêk wê di nava hundûrê renekê fahmkirinê ê sermedî de ku wê li wê were lê hizirkirin wê hebê. Bûyîn wê sînorê wê bi xwe re wê biafirênê li gorî wê.

Wê dema ku em di nava têngîna taoismê de wê bi kosmolojiya wê re dihizirin wê di awayekê de wê, bi awayekê harmonî a pirranîyî wê dîmenekê fahmkirinê bi afirînê wê were dîtîn. Wê mirov rastî gelek awayên vegotinî ku wê li ser têngîna gerdûnê re wê bi wê rengê wê werina ser ziman wê werina dîtîn. Mînaq şewayên vegotinî ên weke yên di nava têngîna taoismê de ku mirov rastê dihê wê, weke 'sihûdu azman û jî metrikse xwe ya aslî derketina wan', 'sihûdu azman û li deh aliyan beşbûna wan', 'sêdûnya û derveyî', 'dûnya hundirîn û bi reng û awabûna wê', 'dûnya bêdarêjk', 'dûnyayên binî' û hwd wê tenê hinek têngîn û serekên ku wê di nava têngînan taoismê de wê mirov karibê kifşbikê ku

wê bi wan wê li gerdûnê wê bi awayekê kosmolojikî wê were lêhizirkirin bê.

Di demên piştre wê dema ku mirov wê di nava taoisma felsefî de wê weke ku mirov dibînê wê, li ser rewşên mejiyî, zêhnî, keseyetî û hwd re wê di awayekê de wê, bi regekê fahmkirinê ê kosmolojikî ku wê li ser wê têngîna xwe ya gerdûnî re wê fahmbikê wê werênê ser ziman. Ew jî wê weke li gorî têngîna 'rêgeza tao' bê wê were dîtin û wê bi wê re wê were ser ziman. Kosmolojiya taoismê wê di wê temenê de wê bi demê re wê rengên cihê wê werina ser ziman û wê di wan rangan de wê bi têngîn û kûrbûna bi wan re wê di regekê de wê bi wan re wê bibê. Ev jî wê weke aliyekê wê yê din bê ku mirov wê di regekê de wê werênê ser ziman bê.

Di aslê xwe de wê, mijara gerdûnê û fahmkirina wê, di wê temenê de wê, bi temenekê fahmkirinê ê kosmolojikî wê bi wê re wê li hebûn û hebûnê wê di temenekê bi girêdanîya wan a bi hev re were danin re wê were lê hizirkirin. Taoism wê weke pêvajoyîna fahmkirinê wê li ser wê temenê wê hin bi hin wê di awayekê di xwe de bi kûrbûnê re wê, bi wê çerçoveya fahmkirinê wê di nava xwe de wê bigihijê têngînek felsefî a gerdûnî û xwezayê di nava xwe de. Di wê çerçoveyê de wê bigihijê regekê fahmkirinê ê rewîstî û felsefeyî. Wê, bi têngîn û rêgeza tao li ser wê temenê re wê **li wê were lê hizirkirin.**

Bi gotinên weke 'ew ji xwe re heya' re wê werênê ser ziman û wê di wê temenê de wê bi wê re wê li wê bihizirê. Li gorî tao wê gerdûn wê tenekê tenknîkî ku ew hatibê plankirin bê. Ew weke hebûnek organîkî bûya. Li gorî wê jî her tiştê ku ew heya wê li gorî tao nbi awayekê nepenî ku ew bi hebûnî bû wê hebûnîya xwe qizinckir.

Li ser wê temenê wê weke ku wê Lao-Tzu wê bi têngînek rewîstî ku ew bi têngîna sîyanê wê dihênê ser ziman re wê li mijarê wê di wê temenê de wê bînerê û wê werênê ser ziman. Li gorî wî li hertiştê bi sîyanî nerîn û fahmkirin wê di wê çerçoveyê de wê li gorî tao bê. Li gorî wê jî bo mirov ya herî baş, qanc, bi weke aqilekê pîroz û di cih de wê ew bê ku ew li gorî tao bûyîne û şibîn û bûna di hevyekiyekê a bi wê re de bê. Li ser wê temenê wê dema ku mirov li ser temenekê rêgezî wê weke ku wê Lao-Tzu wê bînerê ser ziman wê pênc rêgezên tao wê hebin. Ew jî wê ew bin ku derew nekirin, zina nekirin, ne kuştin, ne vexwartin, ne dizin û hwd bin.

Li ser wê temenê wê taoist wê hertimî wê bi jîyanê û kirinê jîyanî re wê di awayekê de wê mijul bibin û wê di temenekê fahmkirinê de wê,

nêzî wê bibin. Li ser wê temenê wê xwe bigihênina li temenekê fahmkirinê.

Di pêvajoyên piştê wê, di wê temenê de wê li ser wê temenê xwezayî wê taoism wê bi gelek şaqên xwe re wê, pêşkeve. Ji tendurustê, heta meditasyonê, kirinên weke bi werjîsî, û heta hunerên levxistinê/xweparastinê, astronimî, sîmya, afsûnkarî, kirinên di dema kirina seksê de ku ew bîn pêşxistin û hwd wê bi wê re wê bi awayekê sazûmanî wê werina pêşxistin û wê li wan wê were lê hizirkirin. Minaq têngînên weke 'Feng Shui' ku wê di wateya rohnibûna gîyanî de wê karibin werina fahmkirin wê di demên kevnera de wê bi wê re wê pêşkevin. Ev rewşên weke yên ku wê bi hunerên levxistinê ku ew dikarin di çerçoveya hunerên werjîsî de jî werina fahmkirin wê bo ku mirov xwe zindî bigirê, di awayekê de baş de hîsbikê û hwd de wê weke kirina pîretikî ku wê di wê temenê de wê li wan were lê hizirkirin bin.

Li ser temenê jîyane civaknasî ku wê weke ku mirov bi 'tao te ching' re dibîne wê di temenekê weke têngînek ramyarî jî wê bi rewîstî wê lê binerê ku wê rêveber û hwd ku ew mudahale û tevlibûnan li jîyanê mirov asayî û xweza nekin. Di wê warê de wê hizrên Lao-Tzu ku wê werênê ser ziman wê, di wê pirtûka xwe ya ku wê weke temenê taoismê jî wê were dîtin wê piştê wê bê temenê xwenûkirinên bi pêşxistinên bi rêveberî, civaknasî, ramyarî û hwd jî. Wê bandûrê wê ji gelek aliyên ve wê, li rengên pêşketinê wê bikê. Di wê temenê de wê, dema ku wê xate pêşketinê wê bi ber jîyan û xwezayê mirov û fahmkirina wê ve wê herê wê, di wê temenê de wê, ev têngînên Lao-tzu wê, temenekê fahmkirinê wê di wê temenê de wê ji aliyê xwe ve wê bikin ku ew biafirênin. Wê dema ku wê bahsa 'bêtevgeriyê' were kirin di nava taoismê de wê, di serî de wê mirov nikarê wê bi temenê ne kirina tişteke de wê fahmikê. Wê di serî de wê di temenekê weke ku mirov kirinekê û ankû pêşketinek mirov ji xwezayê wê û rêya wê ya xwezayî a ku ew pêwîsta bi wê bibê ji wê dûr nekê û mudahaleyê li wê nekê wê di wê wateyê de wê bikê û wê werênê ser ziman.

Li gorî ku wê lao-tzu wê werênê ser ziman wê, li ser wê temenê û mijarê wê di wê rengê de bê ku wê, rêveber zêde tevli jîyane nava gel nebê û mudahaleyên li wê. Bi destûran zêde wê çenekê. Li devera ku zêde destûr (ankû zagon) hebûn wê zêdetirî xirabûn zêdetirî wê, bînpêkirina wan destûran bê û ankû awayên din bê wê zêdetirî wê bibê. Di rengê ku wê Lao-tzu wê werênê ser zima de wê, di wê şewayê de bê. 'desthilatî wê piçûk xwedî kêmbandûr bê. piştê gel pek a û zikê wê têr a.

Jîyane wê rehet a. Cîranê berderiyê wê hebê lê wê gelhê wê zêde nakeve têkiliyê.' Di dewama wê de wê, bi gotinên weke 'gel bi dilxweşî û dilşahiyan dema xwe bi hev re derbas dikê' re wê werênê ser ziman.

Di aslê xwe de wê, gotineka ku wê bi navê Lao tzu wê were ser ziman wê rengê hizirkirina wê û temenê wê bide dîyarkirin. Gotinên weke 'di destpêka biharê û dawîyê de ew şerên ku bênavber dibin wê aramî di nava gel de nehiştina. Civak di nava jîyane xwe de aramiyê dixwezê, ji şeran dûr jîyane xwe di aramiyê de dixwezê' re wê werênê ser ziman.

